Girê Bidêrî

Girê Bidêrî li rexê rojhilat ji çemê Xabûr dikeve. Gir 15 km li başûrî rojhilatî bajarê Hesekê ye û 80 km li başûrê rojhilatê bajarê Qamişlo ye..

Girê Bidêrî ji cihên girîng e li herêmên xabûr di nava qonaxa Bronz a kevin û nû de ye. Gir bi dirêjaya 310 m ji aliyê bakurê başûr û 245 m ji aliyê rojhilatê rojava de, banê wê ji jorîn ve rast e û ji dişta derdora xwe bi 12 m bilindtir e.

Destpêka nişstecihbûnê li vî cihî vedigere herdu qonaxên Helef û Orokêş. Belavbûna nişîngehiya wê di hezarsala 3 an de b.z bi awayekî pir fereh mezinbû. Ji gundekî biçûk pêşket ta gihaşt asta bajarokekî ku bibe ji herêmên Xabûr ê navîn û yê jêrîn ê girîngtirîn di wê qonaxê de.

Nîşaneyên şûnwarî ji me re diyardikin ku koçberiyek çêbûye di vî cihî de di qonaxa Bronz a navîn an go di navbera salên (2000-1600) b.z lê belê nişstecihbûn di qonaxa Bronz a dawî û bi taybet di qonaxa Hûrî-Mîtanî de lê vegeriya, ji ber ku hin bermahiyên avasazî yên avahiyên nişîngehî û odeyên bi tena xwe li wê derê hatin dîtin. Avahiyên Mîtanî li ser dikeyên bi rûbera 25×25 m û bi bilindbûna 1m; dihatin avakirin. Her wiha xelikên li gor şêwaza Xabûr û hin xilikên bi şêwaza Nozî yên girêdayî çanda Hûrî-Mîtanî û nanpêjgeh,muhrên mînatî û parçeyên ji têblêtên mîxî li vî cihî hatine dîtin.

Nişstecihbûn ji nişkêve di despêka qonaxa Asûrî ya navîn li vî cihî qediya tevî ku hin bermahiyên serayekê ku vedigere wê qonaxê; hatin dîtin. Di hundirê wê serayê de komikek ji têblêtên mîxî yên ku vedigerin ji şah Aşûr Kît Leşer (AššŠur Ketta Leš̆r) ê ku ferwerê bajarê Tabîtom bû, dema ku ev bajar bi ser padîşahiya Asûriyan ve bû; hatin dîtin.

Lêkolîn: lîkolîn li vî cihî ji sala 1985 an de dest pê kir, ta sala 1992an ji aliyê şandeya Elemanî bi vediyarkirina lêkolîner Hartmet konh (H.kuhne) û rêveberiya lêkolîner Pîter Biflazner (Peter Pflazner); berdewam kir.

Avahiyên Mîtanî yek ji wan bi şêwazê Tolos e.